Hikûmeta Eyaleta
Bakurê Ren-Vestfalyayê

18.05.2020
Rûpela 1 ji 2yê

Pressestelle Staatskanzlei
40213 Düsseldorf
Têlefon 0211 837-1134
0211 837-1405
yan 0211 837-1151

presse@stk.nrw.de
www.land.nrw

**Danxuyandina Çapemenîyê - 392/05/2020**

# #EzTuEmNRW: Modêlên Rol, di heyama korona-pandemîyê de teşwîqa entegrasyona sosyal dike

**Sitranbêj Eko Fresh û moderator Nazan Eckes, kempeyna entegrasyonê destek dikin û peyamê ji me re dişinin ku em ji bo hev û din bêtir berpirsîyar in**

**Çocuk, Aile, Mülteciler ve Entegrasyon Bakanlığı şunu bildirmektedir:**

#EzTuEmNRW Kempeyna Entegrosyonê û pîrozkirinê, bêyî girêdayîbûna bi serbuhurîya xwe ve ji 2018ê ve entegrasyona bêtir a civatî teşwîq dike. Di heyamên şofa koronayê de fehm û feraseta dualî ji her zemanî giringtir e. Ji ber vî awayî pênc modêlên rol ên entegrasyonê yên ji Bakurê Ren-Vestfalyayê, bi 6400 afîşên di seranserê welêt de daleqandî gazî mirovan dike ku ew ji hev bêtir berpirsîyar bin û guh bidin qaydeyên rojane yên wek şuştina destan û guhdana navberê. Di nava van modêlên rol de pêşkêşkera têlevizyonê Nazan Eckes ve rapger Eko Fresh jî hene.

Wezîrê entegrasyonê Joachim Stamp dema li Dusseldorfê afîşê vekiriye weha gotiye: “Şofa koronayê ji bo me hemûyan zehmetîyeke mezin e. Tevlî vî awayî, eger em wek civat bi hev re tevbigerin, qedr û qîymetê bidin hev û din û guh bidin qaydeyên parastina ji vayrusê ez bawer im ku em ê ji vê proseyê xurttir der bikevin. Em dixwazin bi kempeyna xwe we wêrek bikin. Bakurê Ren-Vestfalyayê eyaleteke xurt e. Eger em bi fikirinî tevbigerin û hev û din destekdayîna hev dewam bikin em ê bi şofa koronayê karibin.”

Sekretera Eyaletê ya Berpirsîyara ji entegrasyonê Serap Guler: “Maneya tevlîbûnê di heman demê de ji hev berpirsîyarbûna me ye. Modêlên rol ên me yên #EzTuEmNRW-yê, li welatê me nûnerên bi milyonan kesên bi tarîxa xwe ya koçberîyê dewlemendbûyî ne. Ji rêncberên dewletê yên polês heta rêncberên birêvebirîyê, serekê goka linge, her kes eşkere diyar dike ku hevkarî ne pirseke kokê ye.”

Eko Fresh vê gotiye: "Vê gavê hevparastina me giring e. Eger hûn li gora qaydeyan tevnegerin hûn ê kesên din jî bixin xeterê. Em teqez dixwazin rê li ber vê bigirin. Li vê derê mebesteke taybet a kempeyna #EzTuEmNRW-yê heye û bi awayekî dilzîz/diltenik gazî mirovan dike. Çi gênc û çi pîr, Corona serêşana me hemûyan e. Di dewra pandemîyê de saxlemmayîna me û mirovên me yên din berpirsîyarîya me hemûyan e.”

Kempeyna #EzTuEmNRW-yê di 2018an de dest pê kir û vêga bêtîirî 40 kesên modêla rol ên ji serbuhurîyên kulturên cuda nîşan didin ku li Bakurê Ren-Vestfalyayê entegrasyon çi çend dikare bi ser bikeve û digel hin zehmetîyan jî kesên ku serbuhurîya wan a koçberîyê hene û tune ne li Bakurê Ren Vestfalyayê çi keysan dikarin bi dest bixin. Ev kempeyn dê heta vê dewra qanûnsazîyê dewam bike.

**Li ser torê çavê we li me be:**

Twîtter: @chancennrw
Facebook: Chancen NRW
Înstagram: chancen_nrw
YouTube: Chancen NRW

***Çi pirsên we hebin ji kerema xwe ji jimara têlefonê 0211 837-2417ê serî li nivîsîngeha çapemenîyê ya Wezîrîya Zarokan, Malbatê, Bextxwazan û Entegrasyonê bixin.***

***Ev danxuyandina çapemenîyê di înternetê de di vê navnîşana webe ya ḥikûmeta eyaletê de jî dibe bê dîtin www.land.nrw.***

***Danzanîna parastina zanyarîyan a li ser çapemenîya civatî***